DANASÎNA PIRTÛKAN

Gerok

Kemal Burkay
Berf fedî dike
Helbest, 120 rûpel.

Li gel kar û xebata xwe ya siyasî, Kemal Burkay xebata xwe ya edebî û hunerî ? bêwestan bi rê ve dibe. Pirtûka bi navê Bef fedî dike, Pirtûka 6- an a şiêrên ronakbîr û siyasetmedarê kurd, Kemal Burkay e. Di vê pirtûkê de bi giranî şiêrên şaîr yên dema salên 1990/94 an cîh girtine. Pirtûka navê xwe daye kaseta koma mûzîkê ya koma Dengê Azadî jî, ku tê de gelek helbestên şaîr hatine xwandin. Naveroka helbestên Burkay felsefeya jiyanê ya cîhanî ye, ku tê de li gel motîfên têkoşîna çînayetî reng û dengên netewa kurd bi hemî taybetmendiyên xwe ronî û zelal cîh digirin. şaîr, li gel rewşa aborî, covatî ya kurdwerî ya sext, dîmenên nexçeya coxrafya û îqlima Kurdistanê jî bi hemî heybet û spehîtiya xwe li ber çavên mirov tên raxistin. Ev pirtûka di nav weşanên Deng de, derketiye.

M. Emîn Bozarslan
Dîtinhezar
Çîrok, 216 Rp.

Pirtûkeka çîrokan e û di rêza " Çîrokên Gelî" yên kurdî da pirtûka 5-an e. Pirtûka "Dîtinhezar" ji du çîrokên gelî yên dirêj pêkhatiye; Yek ji wan çîrokan "Dîtinhezar" e, ku navê xwe daye pirtûkê. Ev her du çîrok- ya mayîn " keçika sêwî û kurikê perî" ye- jî çîrokên gelî, ne û li Kurdistana jorîn ji nava gelê kurd hatine berhevkirin. Ev çîrokên gelî, beşekî giringe in ji folklora kurdî, ku bi sedsalan di civatên Kurdistanê da ji aliyê çîrokbêjên kurd ve hatine gotin û xwe gîhandine me. Ev pirtûka di nav weşanên Deng de, derketiye.

Ahmed Cengîz Çamlibel
Îdyemên Kurdî
Lêkolîn, 208 Rp.

Ji ber ku edebiyate kurdî ya nivîskî zêde pêş neketiye, di zargotina kurdî de qîmetkî mezin ê kurteçîrok, helbest û îdyoman heye. Çunkî di zimanê nivîsandinê de meriv nakare jest û mîmîkan bikar bîne, divê meriv her tiştî biteferuant taswîr bike da ku xwendevan ji mesaja xmeriv karibe bi hêsanî tê bighê. Lê di zimanê devkî de, însan heye ku kare mesaja xwe bi awayekî kurt û muxteser ji hevalê xwe re bêje. Jî bo wê jî hevokên kurt û mana wan kûr û dûr dîvên. Qîmet û rûmeta metelok, helbest û îdyoman ji ber

vê yekê tê, li bakur belkû xebata hevkar Ahmed Cengîz Çamlibeg xebata yekemîna di vî warî daye.

Ev xebat dikare bibe bingehê xebatên hîn ferhtir, Çamlibel, tenê bi berhevkirina îdyoman nehatiye ser û her îdyomek paşê di nav hevkekê de jî bi kar aniye da ku bi hêsanî bê fêmkirin. Ev pirtûk di nav weşanên "deng" de, derketiye.



Doç. Dr. Husên Bekdaş

"**Anatomiya bedena mirovan**"

Anatomî, 64 Rp.

Di meha adarê de di nav weûanên Deng de pirtûkek nû bi navê Anatomiya bedena mirov derket, ew pirtûka li ser ilmê bijijikê bi zimanê kurdî hatiye nivîsandin. Gor zanîna me, anatomiya bedena mirovan pirtûkek ewiliye ku di beşê ilmê xwewzayê bi tîpên latînî hatiye nivîsandin Xêrjî wê pirtûkê bi salan 1978ê li Bexdayê pirtûkekê din bi navê giyanên mirova/ Human body ji aliyê Dr. Ezîz Reşîd Akrayî bi tîpên erebî û bi du zimanan (Ingilîzî, Kurdî) hatibû nivisandin.

Xêrjî wan pirtûkan weşanên din li ser vê beşê em nasnakin.

Pirtûk bingehên ilma anatomî bi 51 şikil û şanan dide nakirin.Ev pirtûka ne ji bo zanîgehên li ser ilmê bijijkî ye. Lê ji ber ku bi zimanekî zelal hatiye nivîsandin zarokên dibistana navbirî, zarokên dibistanên jorîn,beşdarên qursên kurdî li welat derwayîyê welat û hemu kesen ku zimanê kurdî dixwzazin hînbibin dikarin bi wê pirtûkê bixebitin.

Armanc ji bo çapkirina vê pirtûkê ew ku bi zimanê kurdî dewlemend li ser bêşa antomî da jî li jûyan bihêlin ? pêştabibin. Ev pirtûka di nav weşanên Deng de derketiye.

Ahmedê Mirazî Bîranînêd Min Mûranîn

144 rûpel

Wek ji navê pirtûka jî xwiya ye, pirtûk ji bîranînên nivîskar bi xwe pêk hatiye, lê Ahmedê Mirzî kî ye, li nik min Kurdên Bakur belkî zêde neyê naskirin. Girîngiya bîranînên wî dê ji bo me çi be, belku em jê nizanibin. Ji bo wê jî, ka em guh bidin Heciyê Cindî yê ku pêşgotineke delal ji bo van bîranînan nivisiye, da ku em jî zanibin Ahmedê Mirazî kî ye û mana bîranînên wî çi ye?.

Ahmedê şêweşê Mirazî bi eslê xwe dengbêj bû, dengekî xweş lê bû, Gula dewet û şayiyan bû. Wî ne tenê stranên gotî hildide û digot, belê wî wisa jî stran ji ber xwe ve derdixistin û digot: Meriv dikare bêje ku ew him dengbêjm him jî efendêr bû. EW bi vê jî nedihat ser, wî her wiha gelek beyt, serpêhatî, metelok qise dizanibûn. Bi vî teherî ew kaneke zargotina cimetê bû, bi rojan, bi heftan bêrawestan wî dikaribû bistiran de û bipeyviya. Ev pirtûka di nav weşanên Deng de, derketiye.